Meha Adarê li Çiyayê Kurmênc

Gava Bihar tê, bi çiya û deştên me dikeve, darûber, hemî jîndar bi ber hulma wê dikevin, xwîn pê tên, geş û rengîn dibin. Mirov jî, ji bin setema Zivistanê serî radike, xwe davêje û singê xwe ji j

iyaneke nû re vedike, bi agirê Newrozê, xwe ji qirêja dilan, nerindiya mirovan rizgar dike û bi hêviyeke mezin dadikeve meydana jiyanê.

Avdar meha Kurda ye! Li Adarê, hemî birînên me, bîranînên me yên ku li ser rûpelên wê bi neynûkan nikrandî ne, mîna ava kaniyan, zelal ji dilê me û ji kûraniya dîrokê de xwe hildidin. Ji ber ku di deher rojeke wê de yade û bîranînek me heye.

Avdar bi goçbarkirina Barzaniyê nemir dest pê dibe, bi Şêx Se'îdê kal bi dawî dibe. Di navbera wan de Envafal û Helebçe, Serhildan û Newroz, 12 Avdarê û gelek şahî û şînên me rûpelên xwe ji dost û neyaran û ji hemî mirovatiyê re vedikin.

Li roja 12 Avdarê li ser banga tevgera siyasî ya Kurd, bi hezaran şêniyê Kurd, mêr û jin, biçûk û mezin, li Çiyayê Kûrmênc li şar, şarûçik û gundan, li kat 11 nîvro, li kolanan û li ber rêkan pênc deqan bêdeng rêzgirtin û şehîdên berxwedana 12 Adarê li Qamîşlo li bîra xwe anîn. Li kat 11 nîvro, roja 16 mehê, dîsa bi hezaran mirovên Kurd, ji bo bîranîna Helebçeya Şehîd û 16 an li Heleb û Efrînê, dîsa pênc deqan rawestiytan û bi dilsozî û coşeke bilind bi bîra xwe anîn û bi soz û peyman ji hev belav bûn.

Li hêvara 20 mehê jî, roja weqfa cejna Newroza pîroz, cara yekê bû ku li şûn bazara Efrînê def û zurne lêketin, bi sedan jin û mêr, keç, xort û zarok li dora agirê Newroza xwe dîlan gerandin û xwe bi agirê wê vejandin. Çend zarokên biçûk, cilên fodil li xwe kiribûn, gul û mûmên vêketî di destê wan de bûn deketin nava dîlan û gelê xwe pîroz kirin.

Li ser çiyan jî, bi sedan agir hatin dadan û kurdax xemilandin. Li roja cejnê jî, bi deh hezaran mirov derketin sirûşta çiyayê Kurmênc a rengîn, li çiya û baniyan belav bûn, weke hersal, bi dilsozî û agahdariyeke balkêş, ahengên cejna xwe li dar xistin û li hev pîroz kirin.

Tiştê balkêş ew bû, ku berpirsyarên dewletê li Efrînê, îsal hinekî bi hişmendî rewş pîva bûn, wê hêşt ku milet bê asteng rêwresmên yadeyên xwe, li dar bixin. Belkî ji ber wê bû jî ku ji bilî çend qezayên trafîkê yên biçûk, tu teşqele û pirsgirêk nebûn û şahî û bîranîn bi aştî derbas bûn.

Şehîdên me nemirdî ne
Herdem di dilê me de ne
Newroza me pîroz e
Şana azadiya me ye